Serok Barzanî li gel serok Boş rûniştî



Piştî di seredaneka neçaverêkirî de, serok Corc Boş li roja 3/9/2007-ê gehişte parêzgeha Enbar, li ser daxwaza serok Boş, serok Barzanî gehişte parêzgeha Enbar û bi hev re kombûn. Di vê kombûnê de, ya ku Celal Talebanî serokomarê Îraqa Fedral û Tariq Al-Haşimî û Dr. Adil Ebdil Mihdî her du cîgerên serok komarî û Norî Al- Malikî serokwezîrên Îraqê amede bûn. Ji layê welatên yekgirtî yên Emirîka ve, Robert Gîts wezîrê bergirî û Konedelîza Rayîz wezîra karûbarên derve û Stîvin Harlî rawêjkarê karûbarên asayîşa neteweyî û Dêvît Petroyos supasalarê hêzên hevpişka Emirîka û Royan Kiroker balyozê Emirîka li Îraqê û çendîn berpirsên Îraqî û Emirîkî di vê kombûnê de amedebûn. li dor rewşa nû ya Îraqê û Kurdistanê danûstandin kirin, ev kombûn e gelek serkeftî û erênî bû. Têgehiştineka hevpişk di navbera her du layan de hebû, serok Boş, piştevaniya xwe bo serêxistina prosêsa siyasî li Îraqê û berhingariya tîrorî diyar kir.

Ev kombûn e jî berî her du raportên Rayan Kiroker û Divêt Patroyos bo kongirêsî Emirîkî bihêne pêşkêşkirin hatibû girêdan, ew raporta daxwaza kêmkirina hêzên Emirîka li Îraqê û karîgerkirina aştbûna nîştimanî di navbera aliyên siyasî yên Îraqê de kirî û di piştre jî Corc Boşî di gotarekê de bo gelên Emirîka û Îraqê û li pê raspardeyên navbirî biryara vekêşana hêzên Emirîka qonax bo qunaxê girt. Û di ser hindê re ku layenên berhingar di kongirêsa Emirîka de nerazîbûna xwe beranber vê biryarê derbirî.

Şoreşa mezin a Eylûlê şoreşa deskeftên neteweyî bû



Li bîreweriya şoreşa mezin a Eylûlê, ku dibe mezintirîn şoreşa kurdî bi serokatiya babê mezin Mistefa Barzanî û zende baskên pêşmergeyên qehreman xebata miletê kurd bi gişti. Ev şoreş e şiya çendîn deskeftên neteweyî bi dest xwe ve bihînin û miletê kurd ku ji hemûyan giringtir 11 adarê li sala 1970-ê bi vê helkeftê ango li bîreweriya 46 saliya destpêkirina vê şoreşê, Mesûd Barzanî serokê herêma Kurdistanê, peyvek pêşkêşî miletê kurd kiriye û tê de hatiye:

Bi navê Xwedayê mezin û dilovan

Li roja 11 eylûla 1961-ê dîroka nû ya neteweya kurd û rêka ayindeya Kurdistanê destnîşan kir, hîkmeta serkirdayetiya şoreşa Eylûlê, evro zêdetir ji her demekê xuya dibe. demê ku dirûşmê dîmokrasî bo Îraqê û otonomî bo Kursdistanê hilbijartî, gelek bi başî birîn destnîşan kiribû, çinku bê dîmokrasî li Îraqê, ne kêşeya kurdî û ne çu kêşeyeka dî çareser nabe, şoreşa Eylûlê şiya gelek tiştan ji xirabiyê bo başiyê biguhore, lê ya ji hemiyan giringtir, bawerî bi xwe ji nû ve bixelqîne û yekrêzkirina gelê Kurdistanê biparêze, şoreşa Eylûlê ne tenê berevanî ji mafê gelê

Kurdistanê dikir, belku berevanî ji mafê hemû dîmokratxwaz û azadîxwazên Îraqê dikir û Kurdistana rizgarkirî bûbû kelha hemû lêvemayên Îraqê. Şoreşa eylûlê bi hemû wateyekê qutabxaneya şoreşgêrî û exlaqî bû.

Carekê bi tenê jî, karekî neyasayî, ne li nav Îraqê û ne jî derveyî Îraqê, encam nedane, pêşmergeyên qareman tenha bergirî ji gel û welatî nedikirin, belku bibûne hîmayê merdayetî û welarparêziyê, ew hemû deskeftên evro bi dest ve hatîn, hemû dewlet serê şoreşa eylûlê bûne. Bo ayindeyî jî divê destkeftên vê şoreşê biparêzin û peyrew bikin, ewên rojên sext û dijwarên xebatê dîtîn bihayê van deskeftan baş dizanin, ewên hatîn ser sifra hazir jî, heger wê warî nizanin, lê bê nanûxwê nebin.

Li vê roja pîroz, silav bo giyanên paqijê şehîdên Eylûlê û bo giyanê serkirdeyê mezinê vê şoreşê dihinêrin û hemîşe bi rêz û teqdîr vê bîrhatina pîroz yad dikin, pêşmerge û xêzanên şehîdan jî cihê rêz û pêzanên me ne.

Mesûd Barzanî
11/9/2007

COZÊF BAYDIN PROJEYEK BO DABEŞKIRINA ÎRAQÊ PÊŞKÊŞÎ KONGIRISÊ EMRÎKÎ KIR

Cozêf Baydin, nûnerê Kongirisê Emrîkî delîveyek baş heye ku lîsta demokrasxwazê kongireyê Emrîka bo serokatiya Emrîka li 2008-ê bihête berbijartin. Cozêf Baydin di raportekê de ku bo kongireyê Emrîka bilind kiriye, piraniya endaman razîbûna xwe li ser daye ku Îraq bibe sê parçe ew jî: Kurdistan, Şîestan û Sinestan û Bexda jî weku senterê desthelatê bimîne.

Hêjî amajeye ku ev piroj e ji layê dewletên erebî û hindek destehelatdarên Îraqê hate mandelkirin. Belê ji layê hukûmeta Herêma Kurdistanê bi germî pêşewaziya vê pirojeyî kir, dîtina hukûmeta Herêmê eve ku rêkeka guncayî û baş e bo çareserkirina kêşeya Îraqê.

Îraq û Turkiya rêkeftinek dijî PKK morkirin

Li dawiya vê mehê (eylûl) û piştî wezîrê hundirî yê hukûmeta Îraqa Fedral seredana Turkiya kirî û li wê derê rêkeftinek di gel dewleta Tirkî dijî çekdarên PKK ê morkir, ewên ku li ser sinorên Tirkiya- Îraq xebateka çekdarî berpakirîn, nemaze li vê dawiyê ku şerên dijwar li gel hukûmeta Turkiya dikin. Heta niho çendîn kesan ji herdu aliyan giyanê xwe ji dest dane.

Di vê rêkeftinameyê de hatiye ku Îraq rêkê nede hêzên PKK-ê li ser sinorên wê bi ceng in, dîsan ev rêkeftin e rêkê nade Turkiya bo dûçûna hêzên PKK-ê, hêzên xwe bihinêre nav xaka Îraqê. Hejî gotinê, hukûmeta herêma Kurdistanê, gazinde ji wezîrê hundirî yê hukûmeta Îraqê dike, ku ewan haydarî herêma Kurdistanê li ser vê rêkeftnameyê nekiriye, ku girêdayî sinorê herêmê ye û diviya nûnerê hukûmeta herêmê di vê rêkeftinameyê de amede biba..